



Die Senatorin für Kinder und Bildung · Rembertiring 8-12 · 28195 Bremen

Ji bo
Dêûbavan ango Peywirdarên Lênêrîna Zarokan

Auskunft erteilt
Helena Justa

Zimmer 411

Tel. 0421 361-12604
Fax 0421 496-12604

E-Mail:
helena.justa@
kinder.bremen.de

Mein Zeichen
(bitte bei Antwort angeben)
30-1

Bremen, 18.06.2021

Stî û mîrzayên hêja,

Dêûbavên rêzdar ango peywirdarên lênêrîna zarokan,

Ji 1ê Hezîranê ve astengiyên li hêlînên zarokan ên ji ber pandemiye bi berfirehî hatine sistkirin – rêjeya bingehîn a plana rêjeya reaksiyonê derbas dibe. Xebata hêlînê ya rojane, xizmetên piştgiriye û her wisa çalakiyên taybet ên wekî serdana ji bo dibistana seretayî ya ji aliyê zarokên beriya dibistanê ve, pîrozbahî û pîrozkirina xatirjihevwestinê yê biçûk, seyran û hwd. dîsa pêkan in.

Piştî roja Duşema 21.06.2021an hinek serbestkirinên din jî pêk tên:


Li hêlînên zarokan êdî maske ne mecbûrî ye

Mamoste êdî ne mecbûr in li hêlînan maske bi kar bînin – lê belê gava bixwazin dikarin vê yekê bikin. Ji bo zarokên Hortê jî beriya çend hefteyan peywira maskeyê rabûye.

Divê mêvanên ji 10 salî mezintir – ango her wisa dêûbav/peywirdarên lênêrîna zarokan - li hundirê hêlînê maske bi kar bînin.

Derbasbûna ji hêlînê bo dibistana seretayî

Ji hêlînê derbasbûna dibistana seretayî ji bo zarokê/a we bûyereke taybet e. Zarokên li hêlînê dikarin bi mamosteyên xwe re dîsa herin serdana dibistanên seretayî, ew dikarin jî xwe re li polên dersdanê binêrin û li derve li gel xwendekar û mamosteyên dibistanê bicivin. Ji bo vê yekê zarokên hêlînê dikarin wekî îstîsna bêtî testa nû herin serdana dibistanê.

 Eingang:
An der Weide 50

Dienstgebäude:
An der Weide 50
28195 Bremen

Bus / Straßenbahn:
Haltestelle
Hauptbahnhof

Sprechzeiten:
montags bis freitags
von 9:00 - 14:00 Uhr

Tevahiya zarokan dikarin bi hev re herin hewşê

Li odeyên li hundir herî zêde 60 zarok dikarin werin gel hev lê belê tevahiya zarokan dikarin di heman demê de derkevin hewşê. Divê kesên temenmezin her wisa li derve jî mesafeyê bixin navbera xwe û yên din.

Testa zû ji bo zarokan hêj jî pêkan e

Her çiqas hejmara enfeksiyonan kêm be jî hinek tedbîrên pêşîlêgirtinê bikêrhatî ne. Ji ber vê yekê hêlînên zarokan dê bi berdewamî Laientest a ji bo testkirina bi dilxwazî ya zarokê/a / zarokên we bidin we.

Li gel silavên germ Peywirdar

Thomas Jablonski

Rêvebirê Beşa Perwerdehiya Zarokên Biçûk, Piştgiriya Zarokan û Pêşvebirina Xebatkarên